



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

DI KURMANCÎ DE ERGATÎVÎ Û DEMÊN BORÎ

Hamdullah REŞİTOĞLU

14721103

Şêwirmend

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2018

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

DI KURMANCÎ DE ERGATÎVÎ Û DEMÊN BORÎ

Hamdullah REŞİTOĞLU

14721103

Şêwirmend

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2018

KURTE

Armanca vê xebatê ev e ku di zimanê kurdî de du mijarên girîng; ergatîvî û demên borî bi awayekî zanistî û berfireh bide berçav û bê analîz kirin. Bervajî tirkî ku zimanekî nomînatîf-akuzatîf e, kurdî zimanekî ergatîv - absolûtîv (xwerû-tewandî) e. Di zimanên ergatîv de di hevokên bi lêkerên gerguhêz de lêker dikeve bin bandora bireserê. Ango lêker li gorî bireserê tê kişandin û kesandin. Ergatîvîteya kurmancî şikestî ye, anga ergatîvî tenê di dema borî de diyar dibe.

Di vê xebatê de mijara ergativiyê û demên borî hatiye lêkolîn kirin. Ergatîvî çiyê, taybetiyên wê çi ne, di nav civakê de ergatîvî çawa şaş tê bi kar anîn, demên borî kijan in, di demên borî de şaşiyên tîk bikaranîn, hwd. Di vê xebatê de me hewl daye ku em bersiva van pirsan bidin.

Peyvên Sereke

Ergatîvî, demên borî, kurdî, rêzimana kurdî

ÖZET

Bu çalışmanın amacı Kürtçe’de iki önemli konu olan ergatiflik ve geçmiş zamanları bilimsel bir şekilde ele alıp analiz etmektir. Nominatif-akuzatif olan Türkçe’nin aksine, Kürtçe ergatif-absolutif (sade-bükümlü) bir dildir. Ergatif yapıllı dillerde, geçişli cümlelerde fiil öznenin etkisinde kalmaktadır. Yani fiil özneye göre çekimleniyor. Ergatiflik Kurmanca’da sadece geçmiş zamanda görülür.

Bu çalışmada ergatiflik ve geçmiş zamanlar çalışılmıştır. Ergatiflik nedir, özellikleri nelerdir, toplumda nasıl kullanılır, geçmiş zaman hangileridir, geçmiş zamanda kullanılan yapılar, vb. Bu çalışmada bu sorulara cevap bulmaya çalıştık.

Anahtar Sözcükler

Ergatiflik, geçmiş zamanlar, Kürtçe, Kürtçe gramer

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	II
NAVEROK	III
PÊŞGOTIN	1
BEŞA YEKEM	2
ERGATÎVÎ	2
1.1. Di Devokên Kurmancî De Têkçûna Ergatîviyê.....	6
1.2. Aqizatîvî	7
BEŞA DUYEM	8
DEMÊN BORÎ	8
2.1. Dema boriya têdeyî.....	8
2.2. Dema Boriya Dûdar	10
2.3. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî.....	11
2.4. Çîrokiya Dema Boriya Dûdar	12
2.5. Dema Boriya Berdest.....	13
ENCAM	16
ÇAVKANÎ	17

PÊŞGOTIN

Kurmancî yek ji zaravayên kurdî ye ku bi piranî li bakurê Kurdistanê tê axaftin. Wek taybetmendiya her zimanekî, her zaravayekî, taybetmendiya kurmanciyê jî ergatîvîti û zayenda di zimên de, ango nêr û mêtî ye.

Kurmancî zimanekî nîv ergatîvî ye ku ev taybetmendî tenê di demên borî de derdikeve pêşiya me. Lê belê ne di hemû rewşên demên borî de, tenê di lêkerên gerguhêz de ev derdikeve pêşiya me. Ji ber vê meseleya gerguhêziyê jî di demên borî de em dikarin hem kirdeyên sade hem jî yên tewandî bi kar bînin, li gorî rewşa gerguhêzî-negerguhêziya lêkerê.

Di vê xebatê de em ê hewl bidin li ser nasandina ergatîvîteya di kurmancî de bisekinin, tevî mînakên serbixwe û yên ku em ê ji çavkaniyan bigirin. Beşa yekemîn li ser pênase û mînakên vê mijarê ye. Di beşa duyemîn de jî ji bo bêtir famkirina ergatîvîteyê em ê li ser demên borî bisekinin.

BEŞA YEKEM

ERGATÎVÎ

Kurdî zimanekî xwerû û tewandî ye, yanî ergatîv-absolûtîv e. Di hevoksaziya kurmancî de, kirde û bireser bi hev re xwerû an jî tewandî nabe. Wexta ku kirde xwerû be, divê bireser tewandî be, her wiha wexta ku kirde tewandî be divê bireser xwerû be ku ev forma duyemîn di demên berê de tê dîtin, yê wek dema boriya têdeyî, dema boriya dûdar, hwd. Di forma kirde (xwerû), bireser (tewandî) de, lêker li gorî kirdeyê, ango li gorî cînavkê tê kişandin. Lê belê, di forma kirde (tewandî), bireser (xwerû) de jî lêker li gorî bireserê tê kişandin ku ev jî taybetmendiya ergatîviyê ye. Em dikarin bi çend hevokan eşkeretir bikin:

Dema Niha:

Ez sêvê dixim.

Ez pirtûkê dixwînim.

Ez xwarinê çêdikim.

Dema Borî:

Min sêv xwar.

Min pirtûk xwend.

Min xwarin çêkir.

Di van her sê mînakên "dema niha" û "dema borî" de, kirde jî bireser jî yekjimar e. Di mînaka "dema niha" de, lêker li gorî kirdeyê hatiye kişandin, ji ber ku li gorî hevoksaziya kurmancî qaîdeya "dema niha" ev e. Lê di "dema borî" de lêker li gorî bireserê hatiye kişandin, ji ber ku bireser yekjimar in, lêker jî li gorî qaîdeya yekjimarîyê, ango li gorî kesê sêyemîn hatiye kişandin. Di ergatîviyê de, ji bo kişandina pirjimarîyê, em ê bireserên heman hevokên xwe bikin pirjimar:

Dema Niha:

Ez sêvan dixwim.

Ez pirtûkan dixwînim.

Ez xwarinan çêdikim.

Dema Borî:

Min sêv xwarin.

Min pirtûk xwendin.

Min xwarin çêkirin.

Di van her sê mînakên "dema niha" de kirde yekjimar û xwerû ye, bireser pirjimar û tewandî ye, lêker jî li gorî kesê yekem, ango li gorî "ez"ê hatiye kişandin. Lê belê di mînaka "dema borî" de, kirde yekjimar û tewandî, bireser yekjimar û xwerû ye, lêker jî pirjimar hatiye kişandin. Ji ber pirjimariya lêkerê, em fêm dikin ku bireser pirjimar e, her çiqas li gorî şêwazê bi awayekî yekjimar hatibe nivîsîn. Ji ber zelalkirina bikaranîna cînavkan jî, em ê çend mînakên din bidin:

Dema Niha:

Ez te dibînim.

Tu min dibînî.

Ew min dibîne.

Em wan dibînin.

Hûn wan dibînin.

Ew wan dibînin.

Di van hevokên di "dema niha" de, weku tê dîtîn, lêker li gorî kirdeyê hatiye kişandin. Bireser çi yekjimar be, çi pirjimar be, bandor li lêkerê nake. Lê belê di "dema borî" de rewş diguhere. Weku em di mînakan de dibînin:

Dema Borî:

Min tu dîtî.

Te ez dîtîm.

Wî/Wê ez dîtîm.

Me ew dîtîn.

We em dîtîn.

Wan tu dîtî.

Di hevokên jor de, cînavk li gorî rêzê, lê bireser tevlihev hatine dayîn. Weku em dibînin, li vir hevok dimîne bin bandora bireserê de, ji ber vê kirde çiqas biguhere jî, çi yekjimar be, çi pirjimar jî be, lêker li gorî bireserê tê kişandin û qertafa wan a kesane distîne. Di hevoka yekemîn de, kirde tewandî ye û bireser (tu) xwerû ye. Ji ber vê, lêker li gorî kesê duyemîn hatiye kişandin. Her wiha, di hevoka dawî de bireser dîsa "kesê duyemîn" e, lê belê kirde pirjimar e. Weku me berê jî diyar kir, ji ber ku lêker dimîne bin bandora bireserê, pirjimarbûna hevoka dawî vê qaîdeyê naguherîne û lêker dîsa li gorî "kesê duyemîn" tê kişandin.

Weku ji van mînan jî xuya dibe, di ergatîviyê de cînavkên xwerû "ez, tu, ew, em, hûn, ew" dibin bireser û cînavkên diyarkirî (tewandî) "min, te, wî/wê, me, we, wan" jî dibin kirde.¹

Her wiha Bahoz Baran di pirtûka xwe ya *Rêzimana Kurmancî* de, li ser bikaranîna ergatîviyê du agahiyên girîng dide. Weku diyar dike, di rewşa ergatîv de dema ku lêker di nava hevokê de cî bigire peyva piştî wê dibe têrker, cînavk bîn bikaranîn, herdu jî ji koma diyarkirî (tewandî) ne. Ji ber lêkera berpêbûnî (yönlenme fiili), peyva piştî lêkerê dibe têrker (tümleç).

Mînak:

Min gote wî.

Te gote wê.

Wê rahişt pirtûkê.

We nan da Bermalê.

¹ Baran, Bahoz, *Rêzimana Kurmancî*, Belkî, Diyarbakir, 2012, r. 60

Daçek di rewşa ergatîv de jî peyva piştî xwe diyar dikin. Piştî daçekê cînavkên diyarkirî (tewandî) tên bikaranîn.

Mînak:

Min ji pirtûkê hez kir. Xidirî ji wê pirsî.

Hevalan bi çetelî xwar. Me ji wan re got.²

Weku Samî Tan nîşan dide, kurmancî ne tam zimanekî ergatîv e: "... bi riya ergatîviyê lêkerên gerguhêz û negerguhêz ji hev cuda dibin. Di zimanê ku bi temamî ergatîv in de, lêkerên gerguhêz di hemû deman de di bin bandora bireserê de ne. Lê ji ber ku kurmancî bi tenê di demên borî de dikeve bin bandora bireserê jê re niv-ergatîv hatiye gotin. Di kurmancî de tewanga navdêr, cînavk û veqetandekan, hebûna du kom cînavkan têkildarî vê meseleyê ye.³

Ergatîvî bi nivîskî êdî mijareke rûniştî ye, lê belê di axaftinê de hê jî şaş tê bikaranîn li gelek deverên Kurdistanê. Dibe ku ji ber bandora zimanên din be hema hema wenda bûye li hin cihan. Wek mînak, li serhedê, di axaftinan de, ji xeynî kesên biemr, dîtina ergatîviyê zehmet e. Di axaftina wê derê de mirov dikare kirde û bireserê bi hev re di forma "tewandî" de bibîne.

Mînak:

Te min dît. (Te ez dîtîm)

Min te dît. (Min tu dîtî)

Min wî dît. (Min ew dît)

Ev forma axaftinê heke bi nivîskî jî bê bikaranîn, dikare rê li ber gelek şaşfêmkirinan veke. Lewre, kesên li deverên din ên ku haya wan ji vê bikaranînê

² *h.b.*, rr. 60-61

³ Tan, Samî, *Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, Çapa Duyemîn, 2011, r.86

tunene, dikarin mebesta hevokê fêm nekin an jî dikarin bi tamamî şaş fêm bikin. Wek mînak, heke em şûna "min xwar" hevoka "ez xwarim" bi kar bînin, tevliheviyeke mezin derdikeve holê, lewre di forma "ez xwarim" de ne ku kirde tiştêk dixwe, lê belê weku kirdeyek din hebe û "ez" bibe bireser tê fêmkirin. Yanî, wek yê ku tê xwarin "ez" e tê fêmkirin. Weku Tan dibêje, ji ber vê divê em xwedî li forma ergatîviyê derkevin. Ergatîvî taybetiyeke zimanê kurdî ye û wî ji zimanên din cuda dike, lewre jî divê wekî nîşaneyê xweserî û reseniya kurdî were parastin.⁴

1.1. Di Devokên Kurmancî De Têkçûna Ergatîviyê

Di hin devokên kurmancî de ergatîvî ji holê rabûye. Ev yek bi du awayan pêk hatiye. Li herêmên di bin bandora tirkî de lêkerên gerguhêz di dema borî de jî wekî demên din li gorî kirdeyê tene kişandin. Bo nimûne, li şûna "*Min xwest ez te nas bikim.*", "*Ez xwestim te nas bikim.*" tê gotin. Her wiha li şûna "*Min nan xwar.*", "*Ez nan xwarim.*" tê gotin. Ev cure têkçûna ergatîviyê li Kurdistanê zêde ne berbelav e, li hinek deverên Amedê bi ber çavan dikeve. Lê awayekî din ê têkçûna ergatîviyê heye ku li seranserî Kurdistanê berbelav e û di gelek devokên kurmancî de heye. Ji vê formê re di îngilîzî de "*double oblique*" ango "*cot-tewangî*" tê gotin. Di van devokan de têkçûna ergatîviyê bi awayekî din pêk tê. Di demên borî de lêkera gerguhêz li şûna ku bikeve bin bandora bireserê û li gorî wê were kişandin, lêker bi serê xwe dimîne û qertafên kesane nagire. Di van devokan de di demên borî de hem kirde hem jî biresera lêkerên gerguhêz tene tewandin, kirde û bireser ne bi nîşaneyên morfolojîk lê belê li gorî rêzbûna xwe ango bi awayekî sentaksî ji hev tene cudakirin. Wekî mînak, li şûna "*Te ez dît.*", "*Te min dît.*" Tê gotin. Her wekî me li jor jî diyar kir, kirde û bireser ji awayê rêzbûnê ango bi awayekî sentaksî ji hev tene veqetandin.

Mînak:

Min wî dît. (Min ew dît.)

Wî min dît. (Wî ez dît.)

Di vê formê cot-tewangî de di demên borî de mêjer û zayenda bireserê jî bi riya tewangê tê nîşandan.

⁴ h.b., r. 87

Mînak:

Min sêvan xwar. (Min sêv xwarin.)

Zînê Gulê dîtiye.

Ev form di gelek devokên kurancî de heye û ligel ku di zimanê nivîskî de wekî formeke rewa nehate pejiwandin jî gelek kes vê formê dixin zimanê nivîskî, lê li gorî baweriya min ev form di rêzimana kurancî de tevliheviyên mezin pêk tîne û bi tu awayî divê nekeve zimanê nivîskî. Kesên ku vê formê nas nekin bi tu awayî nikarin mebesta bêjer fêm bikin û nikarin kirde û bireserê ji hev cuda bikin. Tiştekî din jî heye ku divê em ji bîr nekin; ergatîvî taybetiyeke zimanê kurdî ye û wî ji zimanên din cuda dike, lewre jî divê wekî nîşaneyê xweserî û reseniya kurdî were parastin.⁵

1.2. Aqûzatîvî

Kurancî Zimanekî diyarker e; di dema borî de lêker gerguhêz be kirde diyarkirî û birêser xwerû ye; beravajîya vê yekê di dema niha, dema bê û raweyên xwestek û daxwazê de jî kirde xwerû ye bireser diyarkirî ye, ji vê rewşê re aqûzatîvî tê gotin. Li gorî vê yekê Kurancî zimanekî nîvaqûzatîv e. Di dema niha, bê û raweyên xwestek û daxwazê de pêveber li gorî kirdeyê qertafan distîne û bireser ji qertafên diyariyê “-ê, -î, -an” ê yekê digire û tê diyarkirin. Di vê rewşê de di şûna bireseran de ku cînavk bîn bikaranîn, divê ji koma diyarkirî bin. Rewşa ergatîv û aqûzatîv du rewşên dijber in.

Mînak:

Ew daran dibirre.

Robîn cilan dişo.

Bila avê bîne.

Dîjle pirtûkê bêhn dike.

Ronî yekî dixwaze.

Divê pênuşê bistîne.

Ez wî dibînim.

Gulan wê çêdike.

⁵ Tan, Samî, *Rêzimana Kurancî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, Çapa Duyemîn, 2011, r.86

BEŞA DUYEM

DEMÊN BORÎ

Ev rawe çêlî karekî ku berî niha hatiye kirin dike. Demên borî giş bi alîkariya rayeka dema borî ya lêkeran û hinek qertafan derdikeve holê. Bi taybetî di navlêkirina demên borî de tevliheviyek heye. Li vir heta ji me hat, me hewl da xwe ku em navlekên ku pir têne zanîn, bi kar bînin. Her wiha me cih neda hinek demên ku zêde nayên bikaranîn.

2.1. Dema boriya têdeyî

Hinek kes ji vê demê re “*dema boriya diyar*” jî dibêjin. Rêşîdê Kurd jê re “*nêzbuhêr*” gotiye. Dema ku bûyerek di demeke diyar de pêk hatibe, ev dem tê bikaranîn. Di tirkî de jê re “*görülen geçmiş zaman*”, di îngilîzî de “*simple past tense*” û di farisî de jî “*maziyê mutleq*” dibêjin. Berê hatibû gotin ku dema paşgirên raderîn ji lêkerên resen bêne avêtin, li holê rayeka dema borî dimîne. Rayeka dema borî bi xwe dema boriya têdeyî nîşan dide. Wekî nimûne, dema ku ji lêkera “*çûn*”ê paşgira raderî “*-n*” bê avêtin, li holê “*çû*” dimîne. Ew jî dema boriya têdeyî li gorî kesê yekjimar ê sêyemîn nîşan dide. Dema bûyerek di demeke diyar de pêk hatibe, dema boriya têdeyî tê bikaranîn. Ji ber vê yekê di nûçeyan de dema boriya têdeyî tê bikaranîn. Ji ber ku di demên borî de lêkerên gerguhêz cînavkên kesandinê yên bireserê digirin ango li gorî bireserê (obje) têne kişandin, di demên borî de rewşa lêkerên gerguhêz û negerguhêz ji hev cuda ye. Lewre jî divê mirov mînakên wan ji hev cuda bide.⁶

Mînak:

Ji bo lêkerên negerguhêz

⁶ Tan, Samî, *Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, Çapa Duyemîn, 2011, r.265

Ketin (xwerû)*Ez ketim.**Tu ketî.**Ew ket.**Em ketin.**Hûn ketin.**Ew ketin.***Daketin (pêkhatî)***Ez daketim.**Tu daketî.**Ew daket.**Em daketin.**Hûn daketin.**Ew daketin.***Ji bo lêkerên gerguhêz**

Di van lêkeran de kirde navdêr û cînavkên tewandî ne, lêker li gorî bireserê têne kişandin.

Dîtin (xwerû)*Min tu dîtî.**Te ez dîtîm.**Wî ew dît.**Me hûn dîtîm.**We em dîtîm.**Wan ew dît.***Vexwarin (pêkhatî)***Min îskanek çay vexwar.**Te îskanek çay vexwar.**Wî/wê du îskan çay vexwarin.**Me tasek av vexwar.**We çay vexwar.**Wan şîr vexwar.***Neyîniya dema boriya têdeyî**

Di dema boriya têdeyî de her wekî demên borî yên din lêker qertafa neyîniyê “ne-”yê digirin.

Dîtin (xwerû) Vegotin (pêkhatî)*Min tu **nedîtî**.**Min **venegot**.**Te ez **nedîtîm**.**Te **venegot**.**Wî/wê em **nedîtîm**.**Wî/wê **venegot**.**Me ew **nedît**.**Me **venegot**.**We em **nedîtîm**.**We **venegot**.**Wan ez **nedîtîm**.**Wan **venegot**.*

2.2. Dema Boriya Dûdar

Ev dem bi alîkariya qertafa “-e” û rayeka dema borî pêk tê; di lêkerên ku bi dengdêrê diqedin de ev qertaf dibe “-iye”. Ji bo vê demê jî em lêkera “ketin”ê hildin dest. Gava qertafa “-iye” bi dûv rayek dema borî “ket”ê bê xistin, dirûvê dema boriya dûdar a lêkera ketin; “ketiye” bi dest dikeve. Ji aliyê wateyê ve ev dem qala bûyerekê dike ku berî niha di demeke nediyar de pêk hatiye. Her wiha dema ku bandora bûyera ku di dema borî de pêk hatiye li ser dema niha hebe, an jî encama wê bûyerê li ber çavan be, ev dem tê bikaranîn. Bo nimûne dema ku em werin malê û bibînin ku derî vekirî ye, em bibêjin, “Derî vekirî maye.” Lê heke em piştî ji malê derketin, were bîra me ku derî vekirî maye, em bibêjin, “Derî vekirî ma.”⁷

Mînak:

Ji bo lêkerên gerguhêz

Wê kinc şûştine û raxistine.

Te heval dîtîye, lê jê re negotiye.

Wî/wê mirov girtîne, piştî jî berdane.

Va ye min nan kiriye.

We hemû fêkî firotîne, tiştêk li holê nemaye.

Wan xanî rûxandiye, li şûna wê avahiyeke nû lêkiriye.

Wan dar birîne, cihê wan kiriye zevî.

Ji bo lêkerên negerguhêz

Binêre, ez hilkişiyame ser darê, hejîran berhev dikim.

Xweziya min bi te, tu gihaştîye armanca xwe,

Ew bi lez meşiyaye, lewma zû hatiye.

Bihara îsal hat, lewma kulîlk zû vebûne.

Mirovek ketiye erdê, divê em wî ji erdê rakin.

Neyîniya dema boriya dûdar

Awayê neyîniya vê demê jî wekî ya dema boriya têdeyî ye.

Mînak:

⁷ Tan, Samî, *Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, Çapa Duyemîn, 2011, r.267

Hatin (xwerû) Vegerandin (pêkhatî)

<i>Ez nehatime.</i>	<i>Min ew venegerandiye.</i>
<i>Tu nehatiye.</i>	<i>Te ew venegerandine.</i>
<i>Ew nehatiye.</i>	<i>Wê tu venegerandiye.</i>
<i>Em nehatine.</i>	<i>Me ew venegerandiye.</i>
<i>Hûn nehatine.</i>	<i>We em venegerandine.</i>
<i>Ew nehatine.</i>	<i>Wan ez venegerandime.</i>

2.3. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî

Ev dem, demeke hevedudanî ye. Wekî "*dema borî ya çîrokî*" jî tê binavkirin. Digel rayeka dema borî, bi alîkariya lêkera "*bûn*"ê pêk tê. Wekî mînak em rayeka lêkera "*ketin*"ê "*ket*"ê bigirin, dîsa rayeka dema borî ya lêkera "*bûn*"ê; "*bû*"yê bînin dawiya wan dê dirûvê dema boriya çîrokî ya lêkera "*ketin*"ê "*ketibû*" derkeve holê. Her wekî berê jî hatibû gotin, li vê derê "*i*" wekî dengê alîkar dikeve navbera du dengdaran. Li gorî kesê ku di bin bandora wî karî de dimîne ango "*bireser*"ê mirov dikare cînavka kesandinê bîne dawiya wê.⁸

Mînak:

Ji bo lêkerên gerguhêz

Min nan xwaribû.
Te kevir avêtibû binê bîrê.
Wê ez biribûm zozanan.
Me kulîlk danîbûn ser gorê.
We dar birîbûn.
Wan erd kolabû.

Ji bo lêkerên negerguhêz

Ew heta sûkê meşiyabû.
Ez hatibûm mala we.
Hûn çûbûn bajêr.
Balafir pir bilind firiyabû.

⁸ Tan, Samî, *Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, Çapa Duyemîn, 2011, r.270

Pelgên daran weşiyabûn.

Neyîniya çîrokiya dema boriya têdeyî

Kirin (xwerû)

Vekirin (pêkhatî)

Min nekiribû.

Min venekiribû.

Te nekiribû.

Te venekiribû.

Wî/wê nekiribû.

Wî/wê venekiribû.

Me nekiribû.

Me venekiribû.

We nekiribû.

We venekiribû.

Wan nekiribû.

Wan venekiribû.

Awayê neyîniyê ya vê demê jî wekî demên din e, lêker qertafa neyîniyê “ne-”yê werdigire. Piştî van agahiyên der barê pêkhatina vê demê de îcar em dikarin der barê wate û cihê vê demê de çend tiştan bibêjin. Ev dem ji bo bûyereke ku berî bûyereke din a dema borî pêk hatiye, tê bikaranîn.

Bo nimûne,

Dema ku ew hat me taştê xwaribû. Li vê derê du bûyer qewimîne; “*yek hatiye*”, berî ku ew were, “*wan taştê xwariye*”. Ji bo zelalkirinê em dikarin çend mînakên din jî bidin.

Mînak.

Roja ku min dest bi kar kir, ew ji kar derketibû.

Duh ez çûm filmê ku me berê li serê xeber dabû.

Pirtûka ku min ji te standibû, hinekan ji min dizî.

2.4. Çîrokiya Dema Boriya Dûdar

Dema ku qertafa “e” tê dawiya “çîrokiya dema boriya têdeyî” ev dem bi dest dikeve. Bo nimûne, çîrokiya dema boriya têdeyî ji bo lêkera “*xwarin*” “*xwaribû*” ye. “Çîrokiya dema boriya dûdar” a vê lekerê dibe “*xwaribûye*”. Ev dem pir zêde nayê bikaranîn. Dema mirov qewimîna tiştêkî ji hinekan bibihîze yan jî mirov bêhemdî tiştêk kiribe, tê bikaranîn.⁹

Mînak:

⁹ Tan, Samî, *Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, Çapa Duyemîn, 2011, r.271

Ji bo lêkerên gerguhêz

Min ev pirtûk xwendibûye, lê nehatiye bîra wî.

Heval ez dîtîbûme, ji min re negotiye.

Wî diyariyek anîbûye, lê nedaye min.

Me hûn êşandibûne, we qet dengê xwe nekiriye.

Wan bar kişandibûye, haya me ji nebûye.

Ji bo lêkerên negerguhêz

Tu ji welêt hatîbûye.

Em ber bi wan beziyabûne.

Ew ji ber dijmin reviyabûye.

Gund şewitîbûne.

Serheng zû çûbûye.

Neyîniya çîrokiya dema boriya dûdar

Neyîniya vê demê jî wekî demên din ên borî ye. Di neyîniya vê demê de jî lêker qertafa neyîniyê “ne-” werdigire.

Mînak:

*Min pirtûkek **nexwendibûye**.*

*Hevêl ez **nedîtîbûme**.*

*We werîs **bernedabûye**.*

*Me hûn **neêşandibûne**.*

*Wan bar **nekişandibûye**.*

*Tu ji welêt **nehatîbûye**.*

*Em ber bi wan **nebeziyabûne**.*

*Wî ji ber dijmin **xwe ranegirtîbûye**.*

*Gund **neşewitîbûne**.*

*Serheng zû **neçûbûye**.*

2.5. Dema Boriya Berdest

Ev dem bi alîkariya qertafa dema niha “di-” û rayeka dema borî pêk tê. Dema ku mirov qertafa dema niha bide ber rayeka dema borî ya lêkerekê dê dirûvê wê yê

“*dema boriya berdest*” derkeve holê. Hindek wê wekî “*çîrokiya dema niha*” jî bi nav dikin. Bo nimûne, dema ku em qertafa dema niha “*di-*”yê bidin ber rayeka dema borî ya lêkera “*çûn*”ê, dê dirûvê dema boriya berdest a vê lêkerê “*diçû*” derkeve holê. Dema ku bûyerek di dema borî de bi domdarî hatibe kirin, ev dem tê bikaranîn. Di îngilîzî de jî vê demê re “*past continous tense*” tê gotin. Ev jî tê wateya “*dema boriya domdar*”.¹⁰

Mînak:

Ji bo lêkerên gerguhêz

Elî mala xwe dişûşt.

Remezane rojiya Remezane digirt.

Dînekî kevîrek diavêt binê bîrekê.

Wan ji erebeyê gelek tişt datanîn.

Zîne hevala xwe nedidît.

Zozane gul diçinîn.

Remo nîsk li zeviyê diçandin?

Ji bo lêkerên negerguhêz

Ew ji cihê xwe nedilivîya.

Hûn ji gund diçûn bajêr.

Hinek mirov ber bi me ve dihatin.

Ew li ber qeraxê çem radiwestiyan.

Kes bi wan ewle nedibû.

Daran pelgên xwe diweşandin.

Di dawîya vê mijarê de divê em li ser taybetiyeke lêkerên ku ji pêşgiran pêk hatine, rawestin. Her wekî berê jî hate diyarkirin di vê demê de qertafa neyînîyê “*ne-*” piştî pêşgirê û berî qertafa dema niha “*di-*”yê tê bikaranîn. Em dikarin çend mînakên li ser vê yekê jî bidin.

Min av venedixwar.

Wî ez ranedikirim.

¹⁰ Tan, Samî, *Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, Çapa Duyemîn, 2011, r.272

*Ew hil**ned**ikişiyān.*

*Em ran**edi**westiyān.*

*Min kakilê mijarê ven**edi**got.*

ENCAM

Her zaraveyekî kurdî xwedî taybetmendiyekê ye, kurmancî jî bi ergatîvîte û zayenda di zimên de taybet e. Ji ber ku demeke gelek dirêj kurdî wek nivîskî hatiye qedexekirin, ziman bi awayekî devkî hewl daye ku bijî. Bivê nevê gelek peyv wenda bûne an jî guherîne, her wiha nifş bi nifş rêziman jî guheriye.

Yek ji van mijaran jî ergatîvîte ye. Ergatîvî di demên borî de tê bikaranîn û mixabin bi demê re di hin herêman de an hatiye jibîrkirin an jî şaş hatiye bikaranîn. Hê jî li gelek deverên Kurdistanê ev mijar tê tevlihevkirin û şaş tê bikaranîn.

Ji ber vê girîngiyê me xwest em li ser ergatîvîteyê bixebitin. Me hem pênaseya ergatîvîteyê diyar kir hem jî bi mînakên em li ser hinek kûr bûn, her wiha me hewl da şaşbikaranîna wê jî bînin zimên.

Herî dawî, ji ber ku bi ergatîvîteyê eleqedar e me hewl da em li ser demên borî jî bisekinin da ku mijara ku me behs kir hinek din zelaltir bibe.

ÇAVKANÎ

BARAN, Bahoz, **Rêzimana Kurmancî**, Belkî, Stenbol 2012.

BEDIR HAN, Celadet Ali & Roger LESCOT, **Kürtçe Gramer**, wergera ji fransî li jêr çavdêriya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Avesta, Stenbol 2004.

BEDIRXAN, Celadet Alî, **Bingehên Gramêra Kurdmancî**, Avesta, Stenbol 2010.

TAN, Samî, **Rêzimana Kurmancî**, Çapa nûkirî ya 3., Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2015.

TAŞ, Çetin, **Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî**, Çapa duyemîn, Weşanên Dîwan, Stenbol 2013.

RIZGAR, Baran, **Uygulamalı Kürtçe Dersleri-Dersên Kurdî**, Çapa yekemîni Weşanên Dozê, Stenbol 2005.



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Bitirme Projesi

KURMANCÇA’DA ERGATİV VE GEÇMİŞ ZAMAN

Hamdullah REŞİTOĞLU

14721103

Danışman

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mardin 2018